Ev meh wisa dagirtiye ku mirov nikane bi nivîsek û du nivîsan rastiya vê mehê li ber çavan raxîne. Minak: heştê wî roja jinên cihanê, **12** hê wê Komkujiya Qamişlo û serhildan, **18** hê wê Hîroşîma Kurdan Halabçeya xwîn niqitand ser dilan, **21** ê wê roja vejînê Newroz û serhildana Kawayê hemdemî, **30** ê wê bîranîna Qomutanê nemir Egît û û.

Piçek dîrok

Heştê Adarê sal **1857,** li cihana nû Amerîkayê, **40** hezar karkerên textilê yên jin li New Yorkê kar berdidin, lê bi destê polisan di halên kar de derî di ser wan de tê girtin. Şewat derdikeve û **129** jin jiyana xwe ji dest didin.

12 Adarê sala **1971**›an serfermandariya tirk li dij tekoşîna şoreşgerên ciwan yên di rêberiya Mahîr Çayan, Deniz Gezmîş û İbrahîm Kaypakkaya de fermana pêşîlêgirtina terorê ragihandin serkariyê.

Di **12** Adara **1996**›an de serkarên tirk ên faşîst li Gaziya Stembolê bi xwînxwarî gulle reşandin ser xwepêşandêrên; demoqrat, welatparêz, şoreşger, sosyalîst û Elewiyên berxwedêr ku bi pirani Kurd bûn.

Beriya yazdeh salan roja **12** Adara **2004** an hêzên dagirker ên Baas a Sûriyê di dema maça pêgogê de li bajarê Rojavayê Kurdistanê Qamişlo bi çavsorî gulle reşandin ser gelê me û**12** welatarêzên Kurd qetil kirin.

Pejna danzdehê Adarê

Dagirkerên sûrî yên Baasî bi xiniziyeke bêbext xwestin ku bi vê kujeriya **12** ê Adarê çavên gelê me yê Rojava bitirsîne. Lê tersê wê bi şahadeta **12** giyanpakan re agirê berxwedanê xwe guhezand gef û gira li dij dagirkerî û xwînxwariyê. Ev raperîn bi hêz û nûvejîna biharî re li tevahiya Rojava belav bû. Her çendî nêzîkî **33** şehît jî hate dayîn, hewldan û provokasyona dagirkeriya Baasî vala hate derxistin. Mirov bi hêsanî dikane bibêje ku bingehê berxwedana vê roja me ku ji Rojava şewle da hemû cihanê, li gel tovên Tevgera Azadî li wir reşandiye ser axê, ta dî wê berxwedana **12**. Adarê de veşartiye û bûye kilîta azadiyê.

Ew raperînên bi biharê re geşdibûn, gelê me kire xwediyê hêzeke bê tewan. Ev bihara îsal ji biharên din cudatir e. Nûvejîna Kobanî bi vejîne xwezayê re hêvî û pêşbîra me derxistiye lûtkeyên herî berz, em li ber pêşa azadiyê ne. Wê Adareke din bibe azadiya gel û welatê rojê, wê ala şehîdan li ser her bihust xaka pîroz bi serfirazî li ba be. We dazdehê Adaran her bibe bîranîn û raperîn.

Parastina Jinê Di Hişyariya Wê De Ye

" Ji ber vê yekê jî dive zilam bighe wê baweriyê ku ne ew e yê ku dikare jinê di civakê de xweşik bike û biparêze ".

Leyla Sadûn - Dêrik

Rast e, rewşa jina Kurd baştir û çêtir e ji rewşa jinên hawîrdorî xwe, û bi taybetî ji rewşa jina Ereb ya ku di nava rewşeke reş û tarî de dijî, û hê dest û hişê wê bi qeyîd û bend in asê girêdayî ye. Lê ev wê wateyê nade ku jina Kurd di rewşeke pirgeştir û pêşketîtir de ye .

Ne veşartî ye di civaka Kurdî de zilam bi xwe alîkar e bi jinê re, destên wê digire ,daxwaza pêşveçûna jinê û berevaniya di ber mafê wê de dike. Ev axaftin û daxwaz gelekî tên dubarekirin û bihîstin. Jixwe hin mirov hene bi xurtî û bi pirbûn van gotinan didêrin, lê dema rastî li rastiyê dikeve ew mirov bi xwe dijî gotinên xwe derdikevin û berî her kesî di rûyê jinê û mafê wê de radiwestin. erê, gelekî dibêjin, lê li ser rûyê erdê li gotin û nerînên xwe xwedî dernakevin û wan napêjin.

Ev rengên kes û mirovan pir di nava rêzên rêxistin û partiyan de têne dîtin. Ew ditirsin ji jinê yan bi gotineke dî ew li ser jinê ditirsin, ji ber dibêjin jin dara şikestî ye û lawaz e, û nikare bi xwe giraniya barê civakê û gotinên wê hilgire, ji ber baweriyê bi şiyan û hêza jinê nayînin, ku jin jî wekî zilam e. Rast e hin tişt hene ku jin nikare bike yan zehmet e pê rabe, lê dive ew bizanin ku jin jî dikare tiştina bike ku zilam nikare bike. Lê dive em bi hev re bigihin wê baweriyê ku herdu du alî ne, her yek ji wana yê dîtir temam dike, dema aliyek wenda bibe, ne xwe kêmasî heye û ew tişt çi be jî, ew sernakeve. Wek çawe zilam xwedî şiyan û hêz e, wisa jî jin di aliyin dî de xwedî hêz e û dikare di gelek aliyan de ser bikeve û serkeftinan bi dest xwe ve bigire .

Ji ber vê yekê jî dive zilam bighe wê baweriyê ku ne ew e yê ku dikare jinê di civakê de xweşik bike û biparêze .

Parastina jinê di stûyê wê de ye, tenê ew di ber parastina xwe de berpirsyar e û em dibînin ku parastina jinê bi hişyarkirin û zanînkirina wê de ye, ji ber dema jin hişyar û zana bibe, wê ew xwe bi hiş û mejiyê xwe bikare xwe biparêze.

ne xwe bi kurtî, em dikarin bêjin parastina jinê di şarezabûn û hişyariya wê de ye.

Rêjîmê Ji bajarê Hesekê Nameyek Rizyayî Şand Ji Amûdê Re

Pêşeroj Cewherî

Ew bûyerên li Hesekê ku vê dawiyê derketin nameyek bû ji aliyê rêjîma hevkara Dai›şê ve ji bo Rojava bi şêweyekî gelemperî û ji Amûdê re bi şêweyekî taybet bû, ji ber kû Amûdê li kantona Cezîrê navanda Xweseriya Demoqratîk e.

Wêrankera komara

Di naveroka nameyê de wisa dihat diyarkirin: wêrankera Komara Mihabadê; ango kamara islam-bazirganî ya Îranê dixwaze Rojava û navanda Kantona Cezîrê li gor me pêwîste tev bigere.

Hêjî gotinên yen di vê derbarê de gelê Kurd li herçar xêzên Kurdistan divê bizane ku sala ٢٠١٥›an jibo me pir giring û pêjînker e, heta radeyekê çarenûsa me di vê salê de dê diser pira seratê de derbas bibe, ji ber ku hemî berjeng vê yekê destnîşan dike. Bo nimûne: Bûyerên li Cezîra Botan, bûyerên Hesekê û leşkerkirina Îranê li Rojhilat ku hêzên xwe topî ser hev dike, ev hemî berjeng in ku neyarên gelê Kurd li şûna gonaxa piştî Daiş lê tiştekî din amade dikin.

Di heman demê de bersiva peyama Hesekê Rêveberiya Xweseriya Demaoqratîk bi serlêdanekê çû bajarê navborî û bersiv wiha da: Hesekê bi hemî pêkhteyên xwe beşek ji Kantona Cezîrê ye û kes nikare vê jiyana hevbeş di nav me de têk bibe û yê bixwaze me nas bike deriyê me li ser vê binçîneyê ji bo her kesî vekirî ye.

Pêwîst e dijminên gelê Kurd di heman demê de bizane ku war ew war e lê buhar nema ew buhar e . îro li Kurdistanê seranser buharek din heye, kulîlk û nefelên wê bi rengê xwîn û berxwedana şehîdana hatiye xemilandin li ser xak û bizava netewa demoqratîk.

Îro Îranê ji herkesî bêtir dizane Kantonên Rojava di dîrokê de cihê Komara Mihabadê derbas kir û bişandina peyamekê li vir û yekê li wir bêguman ev çihê nexweşiyê ye li nik neyaran, lê çerxa dîrokê paş de nazîvire û dem li Rojhilata Navîn dema hilweşandina pergala netew-dewlete.

Di qada navnetewî de Emerîka dizane û ji nêz ve dişopîne ku mejiyê sedsala bîstan nema li bejn û bala herêmê tê û li şuna rêjîmên navendî piradîgma konfîdralîzam demoqratîk baştirîn çareserî ye ,ji ber ku Liwîsê Şazdemîn û Sedam Hisên di goristanên dîrokê de bingor bûn û nema vedigerin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe...Bi Zelalî

Bixwînin:Taha Xelîl Dilê Xwe ji Rojnameya «Bûyerpress» re vekir..

- Ez bi "Rêjîma Sûrî ya faşist, misilmanên erebên tindiraw, û nûkerên kurdan" re lihev nayêm, keça xwe sax dixwazim.
- Min du caran hewl daye ku ez jiyana xwe bidawî bikim, carekê min newêrî bû, û carekê nehiştin.
- Mixabin ew kesên ku Helpçeya min ji dilê min vekirin, ji bajarê Helepça bûn!
- Ez ê tenê di *11* adarê de li ber serê Helpçeya xwe razêm.
- Va dibe salek Helpçeyê *20* deqan jî jibîra min neçûye, ez pirogramek ji *45* deqeyan pêşkêş dikin *3* caran Helpçê tê bîra min.
- Ez eşkere dikim ku Selîm Berkat kilîta helbestê da min, min digot qey Kurd nikarin behsa xwe bikin.
- Helbesta min di rojnameya "Tişrîn" de hat weşandin navê wê " Lelên Dotmam" bû gengeşek di zangoyê de çêkir.
- Dixwazim zû bimrim ji bo bizanibim çi bi Helepçeyê re di wê kêlîkê de çêbû
- Ewqas kîna dinyayê di hindirê welatek piçûk wek Sûrî vala dibe.
- Nelihevhatina kurdan hişt ku şehîdê me pir bibin, nakokiyên me pir bibin.
- Ragihandina kurdî wek hewîtiyê ye, mixabin!
- Bajarê Qamişlo: Tiştê herî min aciz dike, dema ku dibêjin bajarê Evîniyê ye, Keskî pişta vî bajarê negirt.
- Ez li cihekî kar dikim melyon rexnê min li wan hene.!?
- Di Ronahî tv de, behsa pêşmergeyan bi nebaşî hat gotin, rêvebiriya kenal Ronahî tv, rûnişt û biriyar hat standin ku nabe wisa li ser pêşmergeyan bê gotin.
- Ji bo ez heyfa xwe ji jiyanê hilînim meqerisyê pê re dikim.

Hevpeyvîn: Ehmed Bavê Alan.

Pêşî em dixwazin ku tu xwe ji xwendevanê rojnameya Bûyerpress re bide nasîn?
Ez dixwazim wek Tahyê helbestvan xwe bidim nasîn, ne wek Tahayê mirov, jiber ji xwendevanan re pêwîst e ku kesayetiya vê hevpeyîvîn pê re bûye nas bikin. Navê min Taha Xelîl e, kesekî gundî me, li gundê Xizna hatime jiyanê, ji malbatek pirr normal im, min xwendina xwe heta pola şeşan li gundê Xizna tewaw kiriye, min salên zarotiya xwe hemû bi şivantiyê re derbas kiriye, tê bîra min ku çaxa ji şivantiyê vedigeriyam, «etarek li gundê me hebû, ew bi herdû çavê xwe hafiz bû, pirr pirtûk li rex wî hebûn ban min dikir û min jî jê re dixwendin, dibêjim ku ew dastanên ku min dixwendin, tovê helbestê di hinavê min de çandibûn bê ku ez bizanibim..!
Berûvajî wî, ez birayê g e l e k xweşka nim, her û her ez li civata wan bûm, zarotiya min di nav wan de bû stran, civat, tilviziyon û radiyo tune bûn, min li wan guhdar dikir. Piştî ku berê xwendina min ket bajarê Qamişlo mîna ku ez herim buhiştê, min Qamişlo hîn nas nedikir. Li Qamişlo min fam nedikir çima keçikan lêvên xwe sor dikirin? Çima mîna xoşkên min kiras û xeftanan li xwe nakin? Dibe ku wek min ji xwe re digot ku ew bandora çimentoyê ye.!?
Di sala *1982*an de min berê xwe da Şamê ji bo xwendina xwe ya zangoyê bikim, min di amûjgeha şêwekariyê de xwe nivîsî, çend mehan min berdwam kir lê jiber sedema evîndariyê min nedkarî berdewam bikim, yekser min xwe di amûjgeha wêjeya Erebî de nivîsî, di sala *1989*an de min bawernameya xwe stand, min di xwendina xwe de dom kir jiber min berê xwe dabû karê siyasetê, ez di despêka xwe de bi Partiya karkerê kurdistanê (PKK) re bûm. Li vir dikarim bêjim we bi kurtî ev e Helbestvan Taha Xelîl e.

- Hûn kengî pêrgî Helbestê Hatin?
Wek min gote we, ku kengî ew tovê helbestê di hinavê min de hate çandin, pola heştan bûm hin hewldanê min ên nivîsandinê hebûn, wê çaxê ji min we ye ku yê helbestan binvîse, pêwîste ku helbesta wî li ser Filestînê be, heta ku ez bûm pola *12*an, ew hişiyariya netewî bi min re geş bû, di sala *1984*an de helbestên min di hin rojname û kaovarên Sûrî de hatin weşandin, birastî bihna me diçikandin heta ku helbestên me diwşandin. Helbet jiber ku ez Kurd bûm..!? Ez eşkere dikim ku Selîm Berkat kilîta helbestê da min, min digot qey Kurd nikarin behsa xwe bikin û di rojnamê wan de biweşînin, wî ev canê helbestî da min ku ez fedî nekim behsa «Enteriyê, Hilêliyê» di helbestê xwe de bikim..Wisa bi vî hişî û bi Kilîta Selîm Berekat min navê xwe di nav navên mezin de li Şamê û li hin welatên erebî de çêkir.. Nimûneykê ji bo we ez ê bêjim: Min bi zimanê erebî nivîsand «Ez li ser çok û nîvkê stranên xwe dibêjim»! Helbestvanê ereb ji min re digotin te ev wêne, xeyal ji kû de aniye? Ev fantaziya ye nivîsandinek bêhampa ye.! Wisa dibêjim ku helbest sin›et e, li bîra min e çaxa ku cara yekem helbesta min di rojnameya «Tişrîn» de hat weşandin navê wê « Lelên Dotmam» di vir de jî sin›et kar bûm, gengeşek di zangoyê de çêkir gotinek Kurdî di rojnameya «Tişrîn» de hatiye weşandin. Ez dikarim di her gav û kêlîkê de helbestê binvîsim! Dixwazim bibêjim eger helbest tenê îlham ba, çawe tê gotin ku *25* hezar pêxember hebûn wê niha *25* meliyon pêxember hebane, eger mesele tenê îlham ba.! Ez dibêjim sin›et e.
Gotinek Cahiz heye ji bala min naçe ku dibêje:» Wate li kolanan avêtî ne, ‹ibret bikaranîna wan e» û hew..!

- Heta niha Taha Xelîl kela dilê xwe bi nivîsandina helbestê şikandiye?
Erê helbet, min şikandiye ne bi wateya ku ez hew dikarim binvîsim, gelek kel di dilê min de derdikevin ez bi helbestê wan dişkînim, heta ku kelek din tê, û kel di dilê kurdan de xelas nabe..!

- Şoreşa ku niha li Sûriyayê û li Rojavayê Kurdistanê diqwime, hûn çawe dinerxînin?
Ez biguman dibim ku tiştek li dinyayê heye ku evqas xwîn bo wê birje, evqas xelk pakrewan bibin, ez vê pirsê dikim, gelo azadiya mirovan, yan jî welatek yan jî rûmeta mirov hêjaye evqas xwîn evqas can, canê mirov li rex min pîroztir e ji azadiya mirov, jiber ku ez dibînim çi dibe!? Helbet ez nepoşman im ku ev şoreş rabûne, dibînim ku ev tişt divabûn, lê qelen gelek bû..! Ewqas kîna dinyayê di hindirê welatek piçûk wek Sûrî vala dibe, hindirê mirovan xerabû ye, kuştina mirovan bûye tiştek normal, zarok li dîmenên serjêkirinê temaşe dikin, min didît ku şoreşa Sûrî ya herî xweşik bû, û ya herî nexweşik e jî, niha di vê şoreşê de her tişt zelal bûye heval, dijmin, rastî. Şoreşa li Rojavayê kurdistanê nabe ku *%70* buhayê herî mezin bidin, ên din paş guhê xwe bidin û dibêjin em xwediyê vê şoreşê ne, fam nakim ku pakrewanê me li mizgefa Qasimo ne, û ew li ser pakrewanê Der›a yê digrîn, tevlî hirmeta min ji hemû pakrewanan re heye. Nelihevhatina kurdan hişt ku şehîdê me pir bibin, nakokiyên me pir bibin, eger biserketin jî wê nema wek berê bin, wê nema her tişt wek berê xweş bin.

- Bîranînek taybet di van rojan de tê, Taha ji bo *11* adarê çi amade kiriye?
Min helbest çêkirine, stran çêkirine, lê ev min têr nakin, Tiştek tenê heye ku min têr dike, ez dixwazim bibêjim:»Ez bi wan re lihev nayêm, bi rêjîma Sûrî ya fasişt, misilmanên erebên tindiraw, nûkerên kurdan re, ez keça xwe sax dixwazim, ez ê vê ji kurê xwe re bêjim, bila kurê min ji kurê xwe re bêje, wek ku keça Kuleyb gotî ez bavê xwe sax dixwazim. Ez ê tenê di *11* adarê de li ber serê Helpçeya xwe razim. Min ev xistiye dilê xwe û min ji kesekî re jî negotiye.!
Ez û Helpçeyê pir nêzkî hev bûn, dema min nûçeya wê bihîst min nedkarî ez gavekê bavêjim, min nedzanî ez li ku dê me, her tiştê min û wê wek hev bûn, henekên wê, derwên wê, qehra wê, şeytaniya wê. Va dibe salek Helpçeyê *20* deqan jî jibîra min neçû ye, ez pirogramek ji *45* deqeyan pêşkêş dikin *3* caran Helpçê tê bîra min, hisreta wê du cara ez şiwtandim kuştina Helpeça di sala *1986*an de, wê çaxê min got her tişt li diniya yê hêja nema ye, min got her kes dikare me bikuje di wê êşê de Helpçeyê hat, min hemû êşa xwe dabû keça xwe min ducaran Helpçe winda kir. Mixabin ew kesên ku Helpçeya min ji dilê min vekirin, ji bajarê Helepça bûn! Dibe ku ew jî, ji tirajîdiya Kurdan e, Mixabin nayê şirovekirin..

- Hîn Taha Xelîl Tahayê berê ye?
Na! Her tiştê min hatiye guhertin, mînak ez nema ji mirinê ditirsim.! Niha dixwazim bimirim, berê yê herî ku ji mirinê ditirsiya ez bûm!, kengî be çawe be li ku de be ne pirsgirêk e, ez gotinê qelew nabêjim dibînim ku keçka min ji welatê min giringtir bû, dixwazim zû bimrim ji bo bizanibim çi bi Helepçeyê re di wê kêlîkê de çêbû!? Ez niha romana Helpeçeyê dinvîsim, ji *175* rûpela ye, tenê şevek e, Helpçeyê çi dikir, û wan di wê şevê de çidikirin navê wê «Zilamê Mayînkirî» ye, nivîsandina helbestê ji Helpçeyê re hindik e, belengaz e, nikarim jê re tiştan bêjim..helbest ne ya ku tiştan dibêje.

- Ji me re li ser Tahayê rojnamevan biaxive?
Birastî ev kar li min bû bele, rewşek hebû mecbûr bûm ku ez vî karî bikim, heta niha ez poşman im, ez ji siyasetê hez nakim, ez bi dilê xwe diramim, ne ji serê xwe, ez li cihekî kar dikim melyon rexnê min li wan hene.!?

- Ronahî tv wek ku tu di rêvebiriya wê de yî, we xwestiya car caran hin lêkolînên germ çêkin nimûne» Dosyên gendeliyê»?
Her tişt li rex me vekiriyê, dema ku em van tiştan nakin ji qelsbûna karmendên me ne, em gelek pirsan dikin, lê wek dosye me hîn nekirine, û nebihîstine, car caran ew şerê ku li ser wan dezghen dibe ji kînekê ye, em di karê xwe de dixwazin nêzî her tiştî bibin, mînakek tê bîra we ku di Ronahî tv de behsa pêşmergeyan bi nebaşî hat gotin, rêvebiriya kenala Ronahî tv, rûnişt û biriyar hat standin ku nabe wisa li ser pêşmergeyan bê gotin, pêşmerge zarokên me ne, dayikên wan bavên wan cihê hirmeta me ne, siyaset tişteke û karê me tiştek din e, divê hirmet ji pêşmergeyan re hebê.

- Ji bo raya giştî ew bêjera Ronahî tv ku li ser pêşmergeyan axivî, ne siyaseta we bû, û ji bo wilo jî ew ji karê xwe hat dûrxistin?
Helbet, ne siyaseta me bû, siyaseta me di Ronahî tv hermeta kesayetiya ye, ew kes kî be bila bibe, hirmet jê re heye, eger şaştî hebin wê ew şaştî yê kesane bin.! Em dixwazin di karê xwe de pîşekar bin, her kes di Ronahî tv re serbest e çawe karê xwe dike, sînor di karê Ronahî tv tune ne, kî dixwaze were li ser ekranê Ronahî tv bila were çi dibêje ew serbest e li gor pîverên civak û hirmetê jê re..

- Dîse em vegerin Tahayê mirov, piştî ku azadî bê çesibandin, hûnê çi bikin?
Car caran dibêjim ku sax bimînim ez ê ji vir herim, herim kû derê nizanim!?, dibe ku ez herim daristanekê, û carna jî dibêjim piştî ku rewş aram bû ez holek mezin ava bikim û fastîvalek helbestî navdewletî li Rojava çêbikim, ez bang dikim ku kî karibe alî min bike, bila were alî min bike, xwesteka ez vê xwenê bi cih bînim, di hola ku di xeyalê min de holek ji bo Sîneme hebe, şano, şêwekarî, Mozik. Birastî ez nikarim herim ji ber ku Helebçe li vir e, nikarim Dûrî wê herim..

- Wê Taha helbesta dawî ji kê re binvîse?
Bêtir niha ez li ser xwe dinvîsim û dilorînim, ew lorîna stranên xoşik û diya min tên bîra min ez di helbesta xwe di dilorim, dîse ew helbesta dawî ya ku binvîsim wê li ser min be..!

- Taha çiqasî meqerisiyê bi jiyanê re dike? Hûn çiqasî poçan lihev dixin?
Gelekî, digihe astekî ez ji xwe matmayî dimînim. Berê çend mehan ez ze›îf bûbûm, va dîse vegeriyam wek berê, ji bo ez heyfa xwe ji jiyanê hilînim meqerisyê pê re dikim.

- Tu ramiyayî ku wê temenê xwediyê êşan dirêj be?
Na ez dibînim ku wê temenê min nedirêj be, bavê min digot heta ez *100* salî nekim namirim, lê dawî jiyan dikare mirovan pûç bike..

- Taha xwestiye ku jiyana xwe bi destê xwe bi dawî bike.?
Erê, min du caran hewl daye ku ez jiyana xwe bi dawî bikim, carekê min newêribû, û carekê nehiştin, niha ne di serê min de ye, lê dixwazim Helpçeyê bibînim. Niha dixwazim hin tiştan zanibim, hin tiştan bibînim.

- Di yek gotinê de, û di vê qonaxê de, Taha çawe van peyvan şirove dike?
Helbesta Kurdî: Wek Partiyên kurdan e.
Strana Kurdî: Strana çi û halê çi!?
Ragihandina Kurdî: Tune ye. Ragihandina kurdî wek hewîtiyê ye, mixabin!
Bajarê Qamişlo: Tiştê herî min aciz dike, dema ku dibêjin bajarê Evîniyê ye, Keskî pişta vî bajarê negirt, vî bajarî daye her kesî, her kurdekî, di gotinekê de nayê.! Niha çilmisiye, lê ew jî meqersiyê bi jiyanê re dike, bajarê ku ewqas şehîd dane, nema diçilmise.
Hezkirin: Min ji kesekî hez nekiriye.
Berê: helbet, berê belkî jinek nema ku min jê hez nekir. Hezkirin westandin jê re divê û Taha nema dikare, çû helez bûrî.
Gotina Dawî:
Gotina dawî xweska em Kurd gelek caran bibêjin em nizanin...
.

Taha Xelîl»»
Ew ji nifşê salên Heştêyî ye, ku helbestê dinvîse.-
li Sûrî û welatên erebî Ji navên aktîfe di dîmena helbestî de.-
- Bi zimanê Kurdî û Erebî helbestê dinvîse.
- Endamê Yekîtiya Nivîskarê Kurd-Sûriyayê ye. Rûmeta endametiyê di Yakîtiya Nivîskarên Nimsayê de wegirtiye.-
- Endamê Yakîtiya Nivîskarê Siwêsra ye.
- Xelata «Êsliswor» di sala 1999 an de wergirtiye, û wê xelatê didin giringtirîn nivîskar ku wergirandinê bi bi zimanê Elmanî dike.
Xelata «Helbestvanên Nûjeniyê» Siwîsra -1998
Ji berhemên wî yên bi Zimanê Erebî:
- Berî ku Dem Derbas bibe - Qiralekî kor- Bi ku ve Here.
- Bi zimanê Kurdî jî: Şûna Wê
Bi Zimanê Elmanî: Romana «Pirtûka Hevalê Min.-
- Pirtûkek bi Zaravayê Soranî bi navê «Helepçe» helbestvan Letîf Helmet jê re wergirandiye

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe...Bi Zelalî

12 Avdarê

Qolinc bi qolinc dilê min li ber serê te bû
Ji dema xwîn-tewrandina damarên kurdîtiya te
Ji dema ku tu bi min qolincî dibû
Zordestan gef li me dixwarin
Ji dema ku piştiyê qamişê li ser milê tebû
Min xwe bi kirasê te digirt, bi dû te de dibezdiyam
Ji roja te bi zorê ez bişîrvekirim
Min digot: tu hêz nikare min ji himbêza te qutbike
Lê ji roja ku mayîn ketin navbera min û te
Qolinc bi qolinc
Xwêdana eniya te ji çavên min diherikî
Her ku bi sûrên Amedê ve hildiperikîm
Tu li ser kulînka min bû
Min li ser bircên sûrê ji **12** şaristaniyan re behsa te dikir
Min helbestên xwe ji tere bi çemê dicleyê ve berdidan

Rizo Xerzî

Cara pêşî ku qolincên **12** Adarê hatin te
Min dengê gulleya pêşî bihîst û bi destmalka dilê xwe
Min xwîdana te paqij dikir
Ev zayîna te pir cudabû
Ne mîna hemû zayînên tebû
Xwîn pirtir bû
Qolinc dijwartirbûn
Lê bi dengê gulleya dawî re
Mizgîniya zayîna te giha min
Te navê pêçeka xwe kir serhildan
Zarokên te tev
Bi hewara te ve qoriyan
Netirse dayê,' êdî em mezin bûne'

Hewar

Hawar û sed hewar
Bera guhdar bikin mirov û cîhan
Bera bibihîzin vî dengî zevî û ezman
Bera ev dilê birîndar
Bibe bi xwîn nebe gemar
Bera ev çavên şil ziwa bibin ronî bidin
Hawar û sed hewar
Ta kengî em ê mênin di bin destan
Bera Kurdistana me serbixwe û azad bibe
Wî çaxî em ê nas bikin serî ji pê
Bera êdî Qada Çar Çira ban bike Qadî
Bera êdî Sêpê werîsê xwe dirêj bike
Û şoreşa Şêx Se›id ji nû ve destpê

bike
Wî çaxî wê dengê zarok û mendalan
Ji dergûş û hêlanan were
Wî çaxî wê sîrê xav li sînga dayika min vegere
Wî çaxî wê Barzanî ji gorê rabe
Û ban bike: Bijî Kurdistan,
Bijî Kurdistan, bijî kurdistan.

Amûdê.. Agir berdewam e..!

Burhan Hisso

(Çar mirov bi agir şewitîn û mirim)
2015-3-5
Agir û agir em ê bighên jiyanê
Agir, berdewam e
Li keviyên mêlakan pêtên xwe diçêrîne
Hîn av ne afrandêr e
Sinbilên hêviyan di xewnên geniman de
Dimrin
Roj di azmanan werdibe
Bi ser me de dikeve
Hîn em dişewitin tev xewnên xwe
Pêtek ji sînema Amûdê
Ji bo me veşartibûn
Û bi ser me de kirin
Gelo çend buharên şewatê li hêviya me ne?
Çend zistanê birçîbûnê?
Çend payizên ji jiyan weşînê emê biweşin?
Amûdê ....!
Agir berdewam e
Ji dil davêje mêlakan
Ardû mirov in
Gelo Roj parî û çêniyên xwe davêje me?
Yan pêtî û rivînên Sînema şewitî
ji me re hilanî bûn?
Ta kengî em ê bişewitin…eyyyyy
Xwedanê Avê?
çi buharek xemgîn
Dîsa agir mirin
diyarî me kir
Avdar demsala mirina me ye
Me diva salek bê mirin di ser me re bibûre
Gelo çima her gav bi hev re em Dimrin?
Geh bi avê
Geh bi agir
Geh li rê
Gelo çima av li agirê me nabe?
Dilê birîn bi buharekê şa nabe
Êdî birîn nema di dil hiltê
Çar hawêr bêna mirinê
Gelo çend keser ji dûûûûûr…dûr
Wê li ser te biqîrin…Amûdê
Gelo wê kî avê li kezebên şewitî bike?
Hinavên penaber û revyayên ji ber mirinê
Gelo wê kî xewnan bilorîne?
Xewnên zarokan li pey xwe hiştî
Li ber siya mirinê nivistî
Ax ax ax ..Amûdê
Çima mirinên te bi koman e
Bi qevdan e
Bi revdan e…
Wax wax wax…
Şermola mîna Ziyayê maran
Dikişkişe..dirêêêêêj dibe û vedzille
Mirovên bajêr yeko yeko
Deho deho dadqurtîne
Qey naweste?
Ranaweste?
Bûka mirinê Amûdê
Wê ji keserên kîjan penaberî re
Te bughêzin..
Em ê destên xwe li hev bidin û bêjin
Bû û çû
Çû û bû
Wey wax !
Ev mirin e mirin
Çûna bê veger e..bê veger
Mîna penaber û koçberên go te ew
ji ser çavên xwe qewrandin
û yên li pey xewn û keserên wan giriyan
te şewitandin
kom bi kom…Amûdê
komek şewitî
refek revyayî
her comerdiyek te şewatek e
her rûmetiyek te şewatek e
loma agir di laşê te de berdewam e
di hinavên te de avahiyeke deh qonax e
ez zanim
pîvan û pêwanên şewat û agirên bi te ketî
mêraniya te ye
lehingiya te ye
ser bilindiya te ye
hêz û xurtiya dilên xort û keçên te ye
Amûdê..lêêêêêêê
Lê.

Çay Çîrok

Ev çendek bû, di her tora civakî ya medyayê li hevdu xweş bûbûn, an rasttir li hevdu germ bûbûn. Berê parvekirinên hevdu ecibandin, paşî şirove, paşî axaftin û paşî ber êvareke kelegerma havînê, daxwaza çayekî kirin. Yê nêr got, -Em dikarin çayekê vexwin? Bersiv piştî dudiliyekê hat, -çima nebe!...
Ji nişkê ve axaftin sekinî, xuya ye, herdu jî weke margestiyê ji werîs ditirse, bi pirseke 'mezin' likumîbûn; îja dê çi be?
Wan, êdî agir tev dabû û herduyan pir baş dizanibû ku ew ê bişewitiyana lê weke perperika bengiyê pihêtên êgir, herduyan jî nedikarî xwe li ber vê kelê, vê vekêşiyê, vê azweriyê, zeft bikin. Firêna giyanê wan teqiyabû –heke gotin lê be- û wan pir baş dizanibû ku ew li binê tenekeyekê dikevin.
Tev ji binasê/sûcê çayê bû!? Îja çay! Gelo di vê kelegermê de ma ne diviyabû daxwaza vexwarineke tezî û cemidî bikira, îja çay!... Di kelegerma havînê de çay!.. Em çayekê vexwin; çayeke germ!
Ya mê, zûka xwe ji vê dubendiya çayê daweşand, lê dîsa jî pirsek dihat û mejiyê wê diqidqidand. Îja çay!?
Ya mê nedixwest mêrekî ewqas nas bike ku bizanibe 'derewan' dike, yê nêr jî nedixwest jinekê ewqas nas bike ku bizanibe 'xwe tê bialîne'… Wî wisa gel xwe pênase dikir ku şûşa dilê jinan gava ku pê hesiyan ew mêr, 'derewan' gel dike, dişkê û ya mêrî jî gava pê dihese ku jin xwe di giyanê wî dipêçe û dixwaze 'teşeyekî' bidê. Lê baş dizanibû ku mêr jî mêraniya xwe ancax bi têkiliya gel jinê binase, jin jî bi têkiliya gel mêrî; ango jê ve pir ron û zelal bû ku mêr û jin; ax û ava hevdu bûn û bihûşt û cehenema herduyan jî di têkiliya gel hevdu de 'veşar-ti-bû.
Ê axir, êdî çay keliyabû û hêdî hêdî dema xwe berdida. Îja di vê kelegermê de çay!...
Piştî westiyana rojê, digel saeta derketina ji kar herduyan qewlê xwe kire yek ku li mala jinikê çayekê vexwin.
Mêr pir bi kelecan bû lê nedida der, jin jî bi hinceta hevkariyê pir cidî bû. Mêr destvala hatibû, nefikirîbû ku hema kulîlkekê jî gel xwe bîne, a rast ne ku hizir nekiribû, lê nedizanî ka dê rastî helwesteke çawa bê, loma jî hinekî dudilî kiribû û di dawiyê de destvala çûbû mêvaniyê.
Pir cidî axivîn. Çay vexwarin, bi hev re li ser kar û barê jinikê hinekî sohbet kirin û mêr rabû çû.
Helbet ev destpêk bû.
Ev hevdîtinên çayvexwarinê hefteyê çend rojan dewam kir. Sohbet vebû, geş bû… êdî mêr gava diçû, gel xwe nanek jî dibir, ligel çayê berşîvek sivik jî dixwarin bi hev re. Jinê çavên xwe tim direvandin, mêr ber ve diçû. Lê herdu jî hinekî dudil, hinekî bi mesafe, hinekî jî şermînî disekinîn.
Heye ku jinê heta wê rojê di jiyana xwe de mêrekî ewqas paşkêş û şermîn nedîtibe, tew ji cihê xwe nelebike… Liv tune, bizav tune!...
Heta wê êvarê… Bîskek dî zeraqa tavê xwe di bin avahiyên bilind re miçand û hilma bayekî germokî rûyê êvarê ramûsand. Stêrk xuya bû, di pişk peykên ser banên avahiyan bûne hêlîna tivîkan. Li xwarê, kolanê çend şêniyên bajarî vedihewandin, nîviya rêkê ji otoyên parkkirî dagirtibû, serê kuçeya milê rastê, seyarfiroşek ku bêhtir dirûvê polisê veşarî lêbû, di bêdengiya pêşwaziya êvara nû de bûn. Ji germê ye, bi avabûna rojê û piçekî honikbûnê re, jiyanê nû dest pê dikir, li êvarên vî bajarî…
Li ber pencereyekê herduyan, çavek li vê dîmenê gerand. Bêdeng lê kutekuta dilê wan bû. Piştî bîskekê jinikê xwe vekişand û di rûnişdankê de rûnişt, go –Ka em li fotoyên min binêrin! Telefon di nav destî de, mêr hate teniştê rûnişt. Serê herduyan gihîşt hev, na, serê jinikê ser sînga mêrî. Kut kut kut… li jena dilê wî guhdarî dikir. Bayê mê ku jî pişt perdeya tenik dihate hundir û şahidiya wê fesla çayvexwarinê dikir, çaya giyanê wan jî keland.
Hîç neaxivîn, tenê jinikê go – Ev em çi dikin? Û lêvên wan gotin jî wan dizîn. Tenê du laşên tî axivîn, du laşên ku ji zû de hevdu hebandibû û bo hevdu dîn bûn…
Piştî kela xwe di nav nivînan de rêtin, hew dîtin ku di serşokê de weke daralînkekê li hev aliyane. Hê jî li çavên hevdu nenihêrtibûn, jinikê çavên xwe vedişartin, mêr jî…
Çay keliyabû êdî!...

Te çi Divê Tu Hêsirê çav çûka yî

Tu xunava ser gula yî
Bê te bilbil bêzar dibe
Tu dilbera min şeyda yî
Min gorî kir bo te her tişt
Bûm suxtê te bê yek nivişt
Lê zalimê lê dilberê binêre
te çi bi min hişt şîrovek
çi bi te re ye dilo ev ne dadmendî

Bangek

M. Nezîr Remo

Hey hewar ka yekîtî
Li nav baza em in têtî
Te bi vir bes bê fihêtî
Geh li jor in geh li jêr in
Ax û kayê win didêrin
Çi ji hev re şûr û kêr in
Ji neyar re dest bi xêr in
Gel li bendî genmê sor e
Ew bi wer ket tenge tore
Milet we kir pare gure
We ew xiste ber bangor e
Hin dibê win hin dibê we
Reçê Kadiz ji efra we
Tilya dêwa armanca we
Wê kengî bê barana we
Dimdim e lingê Tev - Deme
Enkesa jî lêv timtime
Kuwar naqur pênê Rime
Lê kes nîne bêje çime
Zû herin rajin costî ke
Nekin karê poletîke
Nêr poz bidin bihma rîke
Mê bikin karê morîke
Çi bêjim bo we gereke
Can kursiye pir feneke
Ji kêlan re tu baneke
Sed li cem we weke yeke

Azadî Osê

ye
tirsê meke ji tu kesî
daxsokên te kes tune ye
Ez bi tenê bûme şeyda
Li xwe dikim xeşma dila
Bila dilber bibe ya min
Wê çax mirin tu bê bila

Pakrewan

Hekîm Ehmed

Kenê xwe,
pênûsa xwe,
çavên xwe,
deyne ser maseya min
û van sitêran vemrîne,
xwîna te ye îro
roniyê şîr dide.
Ev dem a xewnê ye..
gunehên te, xwe bi te dişon
û riwê te, mîna rojê
ê herî pak û çeleng e,
ne sabûn dibe,
ne rengîn dibe.

Te zanîbû ez ê bêriya te bikim,
bêriya baskên te bikim
ku her sibeh,
hêviyan bi navê te ve dalqînim.
Delalo..!
Vaye tu.. nameyekî,
ne mîna sirûşê ji jor ve,
lê mîna lavijê bi jor de.
Çavên vekirî soza me bûn
Çavên xwe vekirî bihêle,
ez wilo xwe nabînim ha.

Baran

Baran barî
Li ser rûyê erdê
Dipengizî bi kubarî
Min jê pirsî
Tu ji ku hat û ji kîja warî
goT ez xwêdana
perîşanê cîhanê me
û Hêsrê zarokê
şengal û kobanê

Ronahî şikrî

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe...Bi Zelalî

Di **11.3.2015** An De Cemawr Û Gelek Rêxistinên Siyasî Û Civakî Ligel Malbatên Şehîdan, Serdana Goristana Şehîd Delîl Sarûxan Kirin. Ew Jî Bi Boneya Salvegera Şehîdên Şaredariya bajarê Qamişlo Bû. Par wek Vê Rojê Êrîşeke Hovane Ji Aliyê rêxistna "Da'iş" Li Ser Şaredariya Bajarê Qamişlo Kir, Û Tê De **11** Kesên Sivîl jiyana Xwe ji Dest Dan..

Di Roja **12.3.2015** An De Û Li Bajarê Qamişlo Bi Boneya Yezdemîn Salvegera Şehîdên Serhildana **12**'ê Avdarê **2004**, Stada Şehîdên **12**'ê Avdarê Bi Awakî Fermî Ji Hêla Desteya Spor Û Ciwanan Ya Hikûmeta Kantona Cizîrê Ve Hat Vekirin. Bi Hezaran Cemawrên Bajêr Û berpirsên Hikûmeta kantona Cizîrê Li Vê Vastîvalê Amede Bûn, Û gelek Dezgehên ragihandinî Yên Navçeyî Û Nav dewletî Jî Amade bûbûn. Di vê Vastîvalê De Bi Behan Stran Û Helbest Û Gotar Hatin Gotin, Û Gelek Çalakiyên Sporê jî Çêbûn Ji Wan Matşa Ku di nav Tîma Amedê û Tîma Rojava De ku Di Dawî De Tîma Amedê bi Du Golan Zora Tîma Rojava Bir.

Di Roja **4.3.2015** An De, Û Bi Boneya **5** Sal Li ser Koçbarkirina Torevanê Kurd Ê Navdar Rezoyê Osê, Serokê Desteya Sernivîsê Di Navenda "Bûyerpress" A Ragihandê De, Mamoste Qadir Egîd Û Tîma Rojnameyê Serdana Gora Rezoyê Osê Li Gondê Dekşûrî Kirin. Û Gotinek Bi Navê Navendê Li Wir Hat Xwendin....

Di **14.3.2015** An De Û Li Taxa Xerbî Encûmena Nîştmanî kurdî li Sûriya Cemawerên kurd Vexwendî kirin Ji bo Ahenga Xwe ya Navendî Bi Boneya Roja Zayîna Barzaniyê Nemir, Di Vê Ahengê De gelek gotin Hatin Xwendin ji Wan: Rêxistinên Siyasî, Yên jinan, Ciwanan, û gelek Helbest Jî Bi helkefta vê rojê hatin Xwenid, Û Di Dawî De Koma Narîn Û Hunermend Mihemd kakilo Stran Gotin Û Govendek Mezin ji bo Beşdaran Vekirin.

Di **8.3.2015** An De Bi Awayekî Cuda Jinên Kurd Li Bajarê Qamişlo Li Ber Sînorê Qamişlo Û Nisêbînê Vastîvala Roja Jinê Lidar Xistin, Bi Amdebûna gelek Kesên berpisyar Di Hikûmeta Kantona Cizîrê De ji Wan: Hediya Yûsif Hevseroka Kantona Cizîrê Û Asiya Ebdula Hevseroka Partiya "PYD" Û Gelek Jinên Navdar, Û Bi Beşdarbûna Gelek Komên Hunerî Ku Bi dehan Dîlan Û Stran pêşkêş kirin, Û Bi Stranên Hunermend Canê Govend Û Dîlan Vebûn. Û Li Aliyê Din Ji Sînor Jinên Nisêbînê Hatibûn Ber Sînor Û Silavên Germ Ji Jinên Rojava Re Şandin.

Di **8.3.2015** An De Û Li Herêma Aliyan Ku Dikeve Navbera Dêrik Û Çi Axa De Ahengên Mezin ji Bo Roja jinê Hatin Lidar Xistin.

Di Roja **8.3.2015** An De, Û Bi Boneya roja jinê Ya Gerdûnî Koma Xelat Ya Huner Û filklorê Kurdî li Ber Ofîsa Partiya Yekîtî Ya Kurdî li Sûriyê Ahengek Hunerî Lidar Xist, Û Bi Amedebûna gelek Cemawer Û berpirsên Partiya Yekîtî Ev Aheng Birêve Çû, Û Tê De Gelek Stran Û Dîlan Û Şano Hatin Pêşkêş kirin.

Di **9.3.2015** An De, Û Li Çayxaneya kobanî "**7**" Rêxistinên Civaka Sivîl Semînarek ji bo Giftûgoyê Li Ser Dosya Hilbijartinên Şaradariyên kantona Cizîrê bikin Hat Vekirin. Di Vê Semînarê De, Dr. Mihemed Fatimê Wezîrê Ciwanan û Sporê Di Kantona Cizîrê Û Xatûn Gulnaz Salih Hevseroka komisyona Bilnid A Hilbijartinan Li kantona Cizîrê Hatibûn Vexwndin Ji bo Bersiva Gelek Pirs Û Nerînan Di Derheqê Hilbijartinan De Bidin.

Di Roja **2015 4.3** An De Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Sûriya Li Ofîsa Xwe Roja Koçbarikirna Torevanê Kurd Ê Navdar Rezoyê Osê Bibîr Anî, Û Bi Helkefta Vê Rojê Y.N.K.S Xelata Xwe Ya Bi Navê Rezoyê Osê Diyarî Nivîskar Ebas Isma'îl Kir.

Di **8.3.2015** An De, Ku Ew Roja Jinê A Gerdûnî Ye, **7** Rêxistênên Jinan Li Bajarê Qamişlo Ev Roj Bi Ahengek Mezin Bibîr Anîn, Tê De Gotin Û Stran Û Çalakiyên Xwe Pêşkêşî Cemaweran Kirin, Û Gelek Xelat û Bawernameyên Rêzgirtinê Ji Hatin Belav Kirin.

Bi Boneya **26** Sal Ku Li Ser Koçbarkirina Hunermendê Navdar Mihemed Şêxo re Derbasbûye, Tîma Navenda "Bûyerpress" A Ragihandê Serdana Gora Şêxo Kir, Û Li Wir Gotinek Ji Hêla Birêvebirên Navendê Hat Gotin, Û Li Gel Hinek Ragihêner Û Hunermend Ciwan Cemîl Stranên Şêxo Hatin Gotin.

Di **10.3.2015** An De Û Bi VeXwendinek fermî Ku Ji Hêla Partiya Pêşverû Ya Demoqratî Ya Kurdî Li Sûriyê, Bo Boneya Roja Cil Û Bergên Kurdî Vestîvala Cil Û Brgên Kurdî Li Pêşiya Ofîsa Xwe Li Bajarê Qamişlo Lidar Xist. Piştî ku Keç, Xort, Mezin, Piçûk, Bi Cil Û bergên Kurdî Hatin Vê Vastîvalê, Gotinek Ji Hêla Serkirde Faris Osman Hat Gotin, paşê Meşek Bi wan Cil Û Bergan Berû Ce'da Amûdê Ve Çûn..

Di **14.3.2015** An De, Û Li Hola Subartu Ya Ku Guhdanê Bi çand Û Dîrokê Dike, Semînarek Wêjeyî Li Ser Helbestvan " Dildar Re'ûf" Xwediyê Sirûda Gelê Kurd " Ey Reqîb" Lidar ket, Tê De Nivîskar Mihemed Şêxo Cîgirê Serokê Y.N.K.S, Ev Semînar Birêve Dibir Û Anî Ser Ziman Ku Ew Kî Ye Û Ji Kîja Herêmê Ye Û Çawe Ev Helbesta Wî Bû Sirûda Gelê Kurd.

Di roja **9.3.2015** An De Û Li Bajarê Qamişlo Koma "Ferso" A Hunerî , Ahengek Mezin Bo Biranîna Hunermend Mihemed Şêxo Li Hola Kongiran Lidar Xist. Di vê Ahengê De Koma Ferso Ya Ku Hunermend Se'ed Ferso Sirpirîştiya Wê Dike, Bi Dehan Stranên Şêxo Gotin, Di Heman Demê De Koma Ferso Xelata Xwe Ya Salane, Diyarî Hunermendê Nemir Adilê Hiznê Kir, Û Di Wê Ahengê De Koma Ferso Bi Gurzek Gul Ji aliyê Navenda "Bûyerpress" A Ragihandinê Hat Xemilandin, Û Bi Bawernameya Komîta Maf Ya Mafê Mirovan Ji Hat Xelat Kirin.

Mayîstro Ciwan Cemîl ligel Tîma "Saz Miyozîk" Di Biroveyên Xwe Yên Dawî De Bo Helmeta ku Bi Navê " Em Dikarin" Ku bi Siponseriya Rêxistina Civakên Sivîl Tê şopandin. Ciwan Cemîl Bixwe Serpirîştiya Vê Tîma mozîkê Dike, Xirû Zarok in, Û Cemîl Dixwze Ji Niha De Û Ji Bo Rojên Ku Tên Tîmek Wisa Pispor û Pêşketî Hebe.

Di roja **18.3.2015** An De, Şevek Helbestî Ji Hêla Ofîsa Çand Û Huenrê Ya (PDK-S) Hat Lidar Xistin Tê De Helbestvan Salih Cango Gelek Helbestên Xwe Yên Bi Zimanê Erebî Xwendin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer
Nûçe...Bi Zelalî

Bavo.. Xwezî te bidîta, cihê ku di 2004an de lê hatim kuştin..niha li wir, li gel we, vejîn dibim

Asoyî:

1-Di 12 Adara 2004 an de bû.
2-Kulîlkên Adarê, agir.
3-Zilam, şêwaz.
4-Destpêka şevê.
5-Peyman, bajar (vajî).
6-Gundekî navbera Rojava û Bakur e komkujî lê bûye.
7-Dawiya jiyanê (vajî), nexweşî (vajî).
8-Mêjû.

Sitûnî:

1-Maça evîndaran.
2-Paşnavê yekem şehîdê Newrozê, bang ji dil re (vajî).
3-Pîşeya mafxwaziyê.
4-Paşdaçek (vajî), qeşa.
5-Rik (Bê dengdêr), navê eşîrekê (vajî).
6-Hunermendekî esil ermen bi Kurdî disitrand (vajî).
7-Deryaçeyeke navdar li Kurdistanê (vajî), wekhev.
8-Nehênî, wekhev.

Kurdî Xweş e

Dijminane	عدائي
Diravder	مانح
Diravpêdan	تمويل
Dostanî	ودّي
Dûdan	تعقيب
Encamdan	انجاز
Êrîşbir	غازي
Etom	ذرّة
Fermanber	مأمور
Gerok	متنقّل
Girêbest	عقد , اتفاق
Giştgir	جامع
Gova - Bîner	شاهد
Govayî	شهادة على شيء
Hander	محرّض
Herêma dijfirîn	منطقة حظر جوي
Hevber	نظير

Mamik

- Çar bira ne, yek germ, yek hênik, yek şilî û yek jî sar e.
- Kaxiz e çîzevîz, çû bajarê Evdilezîz, tîne kêfa xort û qîz.
- Gayê kejo, li hewa dajo.
- Çîyayê bê kevir, derya ya bê av, daristana bê dar, bajarê bê mirov.
- Serê mar e, nemar e, diçêre ne kar e, çarpê ye ne dewar e

Bersiva Hejmara 14an: Genim – Def – Dîk – Pîvaz - Nêrgiz

Pend û Şîretên Kurdî «Comerdî û Çikûzî»

- yê comerd berê xwe da buhiştê û yê çikûz agir da ser piştê
- Sifra wî qantir tê de dixeniqin
- Dêmên comerda gewr û geş in, û yên çikûzan tarî û reş in
- Dergehê comerdan bilinde , hindir bi mûm û finde, navê wan li cem xwedê bilind e
- Dana te bi sûd û bêr be, wê dergehê mala te ziv û zêr be.
- Yê Comerd dibêje malê dunyayê ji dunya yê re ye.
- Comerd sê celebin : Nanda, canda û maldan e.
- Malê comerdan û xesîsan (çikûzan) wek hev diçe

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	R	A	P	E	R	Î	N	■
2	A	D	A	R	K	■	A	R
3	M	Ê	R	■	■	A	W	A
4	Û	■	Ê	V	A	R	■	Z
5	S	O	Z	■	R	A	Ş	■
6	A	L	E	Q	E	M	Ş	Ê
7	N	I	R	I	M	■	Ş	Ê
8	■	D	Î	R	O	K	■	Ê

Bersiva 13

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	L	Ê	L	A	N	■	E	M
2	Ê	V	A	R	B	A	Ş	Î
3	V	A	L	A	■	Y	Û	■
4	E	■	E	N	D	Î	Ş	E
5	G	A	■	D	E	N	■	E
6	E	W	R	■	R	■	L	■
7	R	I	S	T	E	V	A	N
8	■	R	E	■	W	A	T	E

Zûbêj

Şûşa şêrîn şemal e, ê şaş û şêt şepal e, şîn kir şap û şal e